

---

# REWŞA HELBESTA KURDÎ A NÛJEN

**Lokman Polat**

---

Di rojhilata navîn de helbesta klasîk a kurdan û farisan dewlemende. Helbesta tirkî a kalsîk tune.

Helbestên ku di dema padîşahê împaratoriya Osmaniyan de dihatin nivîsîn\_ ku jê re dîwan edebiyatî digotin\_ piraniya wan bi farisî û hinek jî bi erebî hatibûn nivîsîn.

Li kurdîstana bakur bîngeheke qedîma helbesta klasîk heye. Melayê Cizîrî, Melayê Batê, Feqiyê Teyran, Ahmedê Xanî û gelek helbestvanên kurd yê klasîk berhemên hêja afirandine, helbestên nemir nivîsîne.

Berhemên wan dewlemendiya edebiyata kurdî ye.

Helbesta kurdî a nûjen li kurdîstana bakur gelek qelse. Li kurdîstana başur û başurê biçûk û rojhilat xurt e. Li kurdîstana bakur roman û çîroka moderin pê ketiye, lê helbesta nûjen pê neketiye. Di hersê perçeyên Kurdistanê de di nav şaxên edebiyatê de ya herî pêş helbeste. Li

kurdîstana başurê biçûk hema bibêj temamê nivîskarên kurd\_ yê bînxetê\_ helbestên kurdî dinivîsin. Lê li kurdîstana bakur yê ku helbest dinivîsin bi tiliyên destan tî jîmartin.

Di salên 1975\_ 80 yê de navê çar helbestvanan derketibûn pêş jî wan her çaran sê helbestvan bi tirkî û yekê bi kurdî helbest dinivîsand. Di wê demê de weşanxanên kurdan heryek bi dehan pirtûkên îdeolojîk, polîtîk weşandin. Weşanên Ozgurluk Yolu\_ Riya Azadî di nav weşandina ewqas pirtûkan de tenê pirtûkek helbestan weşand. Ew jî pirtûka helbestvanê kurdê Kafkasyayê ya Eskerê Boyik bû. weşanên komele çend pirtûkên helbestan derxist, hemû jî bi tirkî bûn. weşanên Yontem û kawa yê jî xwe qet pirtûkên helbestan\_ ne bi tirkî û ne bi kurdî\_ ne weşandin wê demê Apoyî yan qet weşan meşan derne-dixist.

Di sala 1980 yê de darbeya faîşt pêk hat. Salên 80 yê di bin nîrê dîktatorên cun-

---

ta faîşt de derbas bû û di wan salan de pirtûkên helbestên kurdî nehatin weşandin. Li Ewropa yê jî gelek weşanxanên kurdan hebûn lêbelê her weşanxane ancax yek yan du pirtûkên helbestan weşand.

Niha, dema min vê nivîsê, ez ji xwe re li ser nivîskarên kurdên bakur yên ku helbestên kurdî dinivîsin, fikrîm, Yên ku bi kurdî helbest dinivîsin gelek hindik in. Hinek nivîskarên ku berê çend helbestên kurdî nivîsbûn û di kovaran de weşandibûn wan jî dev ji nivîsîna helbestan berdaye, Yek, du nivîskar jî pirtûkeke helbestan weşandine û êdî ne helbest nivîsîn û ne pirtûk weşandin.

Belê di hêla afirandina helbestên kurdî de\_ di dema me de\_ nivîskarên kurd qelsin. Lêbelê hinek nivîskarên ko kurd hene ku bi tirkî, erebî dinivîsin, ew di hêla afirandina helbestê de gelek jîr in û her yek çend pirtûkên wan yên helbestan\_ bi zimanê serdestan\_ derketine. Yilmaz Odabaî yek ji wan helbestvanane ku gelek pirtûkên wî bi tirkî derketine. Ew bi xwe kurd e û ji Amedê ye.

Di nav kurdên bakur de yên ku wekî helbestvan hatine naskirin û pirtûkên wan yên helbestan\_ bi kurdî hene, di serî de **Rojen Bamas** û **Kemal Burkay in**. Rojen Bamas di hêla afirandina berhemên erebî de helbestvanekî qelse, berhemkar nîne. **Kemal Burkay** berhemkare. Ew xebatkarê edebiyat û siyasetê ye. Ew jîr û zana ye û bi destekî du zebeş hildigre, siyaset û edebiy-

atvaniyê bi hevdu re dimeşîne.

Di nav helbestvanên kurdistanê bakur de sê jin hene ku hêjayê pesnê ne. Yek jê **Fatma Bozarlane** (Ew çû rehmêtê) û ya din jî **Diya Azad Acaire**. Ya sêyem helbestvana jin ku niha li Amedê dimîne û navê wê **Yildiz akare**. Pirtûka wê ya helbestên kurdî hêj nû derketiye. Hersê jinên helbestvan jî her yekê pirtûkeke helbestan weşandin. Li hersê perçên kurdistanê gelek helbestvanên jin hene, lê li bakur tenê çar pênc jinên helbestvan henin. Helbet hinek keç û jinên kurdistanê bakur di kovarên kurdî de helbestên kurdî dinivîsin û diweşînin, lêbelê hêj pirtûkên wan yên helbestan derneketine.

Min bala xwe da weşanxanên kurdan yên li Stenbolê, wan bi sedan pirtûkên tirkî weşandine. Bi dehan pirtûkên helbestan yên bi tirkî weşandine û yek du pirtûkên helbestan yên bi kurdî weşandine. Mirov dema li hejmara pirtûkên helbestan yên bi kurdî dinêre, dibîne ku helbesta kurdî bê çiqasî qelse.

Her çiqas îro helbesta kurdî a nûjen qels be jî, divê bi hewldanên pîroz, bi kar û Xebateke baş, bi şêweyeke berhemkarî helbesta kurdî pêş bikeve, dewlemend bibe, Di vê hêlê de hewildanên baş hene û hinek weşanxane jî\_ herwekî weşanên Sî\_ Mîr, pêrî, Aram, Veng, Helwest, Nûdem, Roja Nû\_ Girîngîdane ser weşandina pirtûkên helbestên bi kurdî.